

**Wê çi biqewime
eger Xamineyî
bimire**

»»» R:7



**Dagîrkarî û
cînosayda ji aliyê
Erdoxan ve**

»»» R:8



**Hevalên me
tenê çiya nînin**

»»» R:2



**Qonaxeke nû li ji-
yana siyasî ya Rojavayê
Kurdistanê**

»»» R:4



Lîstika wafîbolê

»»» R:5



*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (360) 23-10-2019 Buha (1000) Tûmen

Tirsa Cemaranê

**Piştî vekişîna hêzên Amerîkayê
ji deverên sînorî ên Tir-
kiyê û Sûriyê, dewleta Tirkîyê
bi awayekî berfireh êrîş kire ser
Rojavayê Kurdistanê, ew êrîşane
di asta navneteweyî de dengvedan
û dijkiyarên berfireh li pey xwe
hebûn, û berevajî çavniherîna
Tirkîyê wekî duyemîn hêza leşkerî
ya Natoyê, raya giştî a cîhanê
piştevanî ji Kurdên Sûriyê kir.**

Tenê çend rojan piştî êrîşa Tir-
kiyê li ser Kurdiştana Sûriyê,
hêzên Kurdî bi merema seki-
nandina êrîşên Tirkîyê, bi
navbeynkariya Rûsiyê, digel
dewleta navendî ya Sûriyê rêk-
kevtinek wajo kirin, ku bi vê
sedemê hêzên leşkerî ên Beşar
Esed vejeriyane ser sînoran.

Wekî ku îşare pê hate kirin, êrîşa
Tirkîyê bo ser Kurdên Sûriyê, di
asta cîhanî de dijkiyar li pey
xwe hebûn, û Yekîtiya Ewropayê,
Yekîtiya Ereb û piştî jî Kongirê-
sa Amerîkayê ew êrîşe şermezar
kir, û heta rexneyên tund jî li
“Danild Tiramp” girtin, û ragi-
handin ku, bi sedema biryara wî,
ew êrîşe hate kirin, heta biryara
navbirî wekî “xiyanet bi gelê
Kurd” dane zanîn.

Kongirêsa Amerîkayê bi 354
dengên “erê” li hember 60
dengên “na”, dijayetiya xwe
digel vekişîna hêzên Amerîkayê
ji Sûriyê ragihandin, û daxwa-
zkar bûn ku Tiramp ji biryara
xwe paşekêşe bike, û bi hêlana
leşkerên Amerîkayê, canê he-
valbendên xwe ên li şerê li dijî
DAÎŞê de biparêze, û di warê
siyasî de jî garantiya wan bike.

Kurd di Sûriyê de, di çend

salên derbasbûyî de,
tevî hêzên heval-
bend bi serpereştiya
Amerîkayê li dijî di-
jminê herî hov ê miro-
vahiyê şer kirin, ku
tevî têkşikandina wan,
nirxeke giran wate 10
heya 11 hezar şehîd
dan, lê niha ji nişkêve
xwe li hemberî duy-
emîn hêza leşkerî ya
Nato`yê dîtin.

Nerizayetiyan tenê
dewlet û siyasetme-
dar bi xwe ve ne-
girtine, û piraniya

şeqamên Kurdistanê,
nemaze li Rojhilat,
û herwisa piraniya
bajarên Ewropayê jî,
şahidê xwenîşandana
Kurdên penaber di
wan welatan de bû,
ku tevî rexnekirina
siyaseta Danild Ti-
ramp, êrîşa dewleta
Tirkîyê şermezar kirin,
û piştevaniya xwe ji
Rojavayê Kurdistanê
nîşan dan.

NY her di yekem
deqeya deştêpêka şer
de ragihand, ku tê

kuştin, ku pareke herî zêde ji wan xelkê sivil û bêberevan
yên wan deveran in.

Piştî çend roj êrîşkirinê, roja 25`ê Rezberê, Tiramp careke
din hate ser xet, û ji riya heyeta danûstandinkar li Tiriye
ve eşkere kir, ku agirbeşteke çend rojî di navbera du aliyên
şer de pêk aniye, bi vê mercê ku hêzên Kurdî yên Sûriyê bi
kûrahiya nêzî 40 km, ji sînoran dûr bikevin, da ku devera
ewleh bê avakirin.

Eva ku di vê navberê de girîng e, helwesta
nîştimanperwerane ya gelê Kurd li çar aliyên cîhanê ye, ku
bi bê berçavgirtina sînorên deştêkîrî û tenê li rûyê hesta
nîştimanî û nirxandina rewşê, daketine kolanan, û bi her
awayekî ku ji deştê wan hatibe, piştgiyariya xwe li xwişk û
birayên xwe nîşan dane.

Di rojên derbasbûyî de hemû tex û qatên Rojhilatê Kurdis-
tanê, jin, ciwan, xwendekar, mamosteyên olî, werzişvan,
û bi giştî hemû tex û qatên civakê, çi bi rêxistina
xwenîşandan, û çi jî bi gotina siloganan, û çi jî bi riya ragi-
handinan erkên nîştimanperwerane yên xwe bi cih anîn.

Di vê navberê de, nabe vê yek jî em ji bîr bikin ku rejîma
Îranê wekî sereketirîn dijminê gelê Kurd di her çar parên
Kurdistanê de, hemû hewla xwe da, bona ku ji aliyekî ve,
kerb û kîna dîrokî ya xwe nîşanî dewleta Tirkîyê bide, û ji
aliyekî din ve jî, wiha bide zanîn ku piştevanê Kurd e, û
ev kiriyara Tirkîyê bi karekî nemirovane dibîne, di halekê
de ku ji tu kesî veşartî nine, ku rejîma Îranê derheq hemû
daxwazeke Kurd bitaybet li Rojhilatê Kurdistanê, siyaseta
piştguhxiştinê girtiye pêş, û nikare serwerî û mezinatiya vê
neteweyê bi çavên xwe bibîne.

Di vî alî de jî me dît ku hemû hewla xwe da, da ku bîr û
hizra xwenîşandan veguherin bo silogana “Merg ber Am-
rîka”, lê ew fêl gellek zû ji aliyê xelkê ve hate eşkerekirin
û xwenîşandan siloganan wekî “Bijî Kurdistan, bijî
Pêşmerge, Rojava Rohilat e, Kurdistan yek welat e” di-
gotin. Di dawiyê de me mêzeyî piraniya bajarên kir ku
çalakvan û rêxistînan wê xwenîşandanê ji aliyê dezgehên
serkutkar ên rejîma Tehranê ve hatin binçavkirin, û raştî
lêpîrsîn û îşkenceyê hatin.

Herwisa li rojên piştî rejîmê tirs û nigeraniya xwe li hem-
ber mana Tirkîyê nîşan da, û ji vê yekê ditirse ku her çi li
Sûriyê de vehûnandiye, li wir vereşe, û hemû nirxên ku
danî, heder herin, û cardin di Sûriyê de dorandineke din
raştî wê were.



pêşbînîkirin bi sedema vî şerî aliyê kêm 160
hezar kes aware bin. Heya niha amareke hûr li
ser zîraren vî şerî nehatine belavkirin, lê çavkani-
yên xwecihî basa vê hindê dikin ku heyra niha
gellek kes di encama topbaran û bombebaranê ji
aliyê Tirkîyê ve hatine birîndarkirin yan jî hatine

Sergotar

Hevalên me tenê çiya nînin

N: Kerîm Perwîzî

Ev bi sedan salan e ku nîştîmana Kurdan raştî gef û êrîşan tê û di dîroka vê navçeyê de bi sedan û hezaran caran êrîşa hoz, eşîr, koçer û împiratûriyan li hemberî Kurdiştanê hatiye tomarkirin û bi sedan tirajêdî û hemase hatine afirandin.

Her car ku wê demê dujminan êrîşî ser Kurdiştanê kiriye, dema ku Kurdan nedikarî li hemberî êrîşa sedan hezar leşkerên tawanbar derkevin, hawara xwe dibirin çiya û geliyên Kurdiştanê û çiya bûne êvirgeh û li pişt Kurdan sekinîne û Kurd ji tirajêdiyan paraştine.

Leşkerê dagirkar di riya bejahî de êrîşî ser wan dikir û di gelî û çiyayan de nedikarî li hemberî êrîşên Kurdan derkevin. Lewma jî dev ji Kurdan berdidan û diçûn cihekî din. Bi vî awayî, di dîroka sedan sal û hezaran salan de çiya bûne hevalên Kurdan.

Lê niha guhertin di hin tiştên girîng de çê bûne û ew piştevanên Kurdan ji rewşa berê derbas bûne.

Guhertineke girîng ev e ku teknolojiya şer a dujminên Kurdan hatiye guheretin û êdî pêwîstiya wan bi hêzên bejahî nîn e û li gor heyva destkird angû setelaytê, bi balafirên bêpilot û di riya hêzên esmanî re heya kûrtirîn geliyan û diwartirîn gupîtkên çiya jî diçûn û êrîşan pêktînin. Êdî bi vî awayî, çiya nikarin bi hêsanî pişt Kurdan germ bikin. Ev jî dibe sedem ku di pêşerojê de rewş were guhertin.

Tevî hemû xirabiyên van tîknolojiyên nû ên şer, encameke baş jî li pey wan tê. Encam, ev e ku êdî Kurd

Rewşa Kurd li Rojhilatê Kurdiştanê û Rojava hate gengeşekirin



Şandekê hevpar ya Yekîtiya Ewropa û Parlemana welatê Sûêdê, serdana PDKÎ kirin.

Paşnîvroya Roja Şemî, 27'ê Rezberê, Şandekê hevpar ya Parlemana Ewropa û Parlemana Sûêdê, bi serokatiya "Evîn Încîr", endama Parlemana EU, serdana PDKÎ kirin û ji aliyê Hey'eteke PDKÎ ve, bi serokatiya "Mîstefa Hicrî", Lêpirsyarê giştî yê PDKÎ ve, hate pêşwazîkirin.

"Evîn Încîr", keyfxweşiya xwe û hey'eta xwe li derheq wê serdanê Nîşan da û rola PDKÎ di tevgera neteweyetiya Kurd de, bilind nixand.

Piştî hingê, "Hicrî", tevî pirozbahî kirina "Evîn Încîr" bi boneya Endam bûn di Parlemana Ewropayê de, spasî ji serdana navbirî û hey'eta digel re kir.

Di wê hevdîtîne de, guhorînên di Kurdiştanê de û bi taybet rewşa Kurdiştana Rojava û Rojhilatê hate bas kirin û Lêpirsyarê Hizbê, rola parlemana Ewropa û welatên endamên vê yekîtiyê, bi hurdekariyan ve bas kir.

Di beranber de, hey'eta mêvan, hewlên xwe bo nîşandana belengaziya gelê Kurd di raya giştîya Ewropa û parlemana Ewropayê de, bas kirin.

Di vê rûniştîne de, "Qadir Kesîrge", endamê parliemana welatê Sûêdê, "Serko Gelalî", endamê Parlemana Kurdiştanê û hey'teke Yekîtiya Nîştîmanî di welatê Sûêdê, pişikdar bûn.

neçar dibin tenê pişt xwe bi çiya germ nekin û deriyekî vekin da ku bajar jî li pişt wan be. Ev tê vê wateyê ku xebata çiya û bajar li hev bîne girêdan. Bi vî awayî guhertineke stratejîk di xebata Kurdan de çê dibe û çiya bi tenê namîne û wê bajar jî bibe hevlekî din ê bingehîn ji bo Kurdan.

Faktoreke din guhertina alavên teknolojiya pêwendiyê ye. Şoreşa alavên pêwendiyê bûye sedem ku êdî şer û malwêranî li Kurdiştanê bi bédengî neyê kirin.

Berê, Muxul û hozên din bi hezaran kîlometran derbas dikirin û êrîşî ser Kurdan dikirin, herwisa hozên hov ên navçeyê weke Hexamenîşîyan û vê dawiyê jî Ataturk, Sedam, Xumeynî û Esed li Kurdiştanê karesat çê dikirin lê haya kesî jê nebû yan jî bi dehan sal derbas dibûn heya xelkê din haydarî rewşa Rojhilata Navîn dibûn. Lê niha rewş hatiye guhertin û di çend çirkeyan de tawanbar têne riswakirin û mijar li hemû cîhanê deng vedide.

Ev mijar û tirs civaka cîhanî ji belavbûna mirovkuj û hovan li hemû cîhanê bûye sedema guhertina rewşê û bi vî rengî Kurdan dostên nû ji xwe re dîtine. Ew jî heman raya giştî a civakên cuda û tirs siyasetvanan ji raya giştî a xelkê wan e. Di encamê de Kurd ji berê zêdetir û baştir dikarin ji xwe re li pey hevalan bigerin.

Lewma jî Kurdiştanê û Kurdan hevalên nû hene û divê bikevin hizra berfirehkirina stratejiya xebata nîştîmanî. Bi vî awayî Kurd wê bikaribin kanalên dost û hevalan jî berfireh û xurtir bikin. Êdî nabe em tenê çiyayên Kurdiştanê weke hevalên xwe binav bikin.

Dibe ku stratejiya dujmin ev be û bixwaze em li wir asê bibin û me jinav bibe. Êdî divê em bajar û çiya û kalanên raya giştî a cîhanê bikin bingeha xebatê da ku di encamê de bi hêz û hizreke nû, dîrokê bi destên xwe binivîsin.

Karesat li pey karesatan li Rojava



N: Sebrî Resûl

Bûyerên Sûriyê ji heşt salan ve, valatîyek di binyata hizra siyasî ya Sûrî bi giştî û bi taybetî ya Kurdî de peyda kiriye, heta radeyekê ku êdî şopîner û xwendevanên siyasî nikarin bûyerên bilez û guhertinan bişopînin.

Deverên kurdî di qada siyasî de germ in, û guhertinên nû helwestên hemû aliyên navxweyî, herêmî û navnetewî şikandine, û çarenivîsa hebûna gelê Kurd li ber ba û bahozê ketiye, nemaze ku nakokîyeke kûr heye di qada kurdî de, di navbera ENKSê

û PKKê de, ku Encûmena Niştîmanî ya Kurdî li pey rêbazeke netewî ye, û sîstema PKKê li pey siyaseteke pragmatîk e û li dijî bîrdoza netewî ye, ku bi awayekî leşkerî kurdiştana Sûriyê û jiyana xelkê wê kontrol dike. Sîstema PYDê ji bo birêvebirina herêma Kurdî li ser asta siyasî û leşkerî têkşikest, lê berevajî serkeftî di paraştina berjewendiyên rêjîma Sûriyê de bi riya tinekirina hêzên siyasî yên Kurdî û serkutkirina çalakvanên tevgera lawên kurd de, bi dîktatoriye û bi hêza xwe ya leşkerî, û herwisa serkeftî di xurtkirina dijminatîya bi Tirkîyê re, û peydakirina hincet û bihaneyên destêwerdana wê di karûbarên kurdiştana Sûriyê de, û karî balê bikişîne li ser pîrsgirêka kurdî li Sûriyê weke pîrsgirêkê li dijî Tirkîyê. Şikestinên siyasî û leşkerî berdeham in, û bajarên Kurdan wekî pelên daran li

payizê têne xwarê, bêyî ku hêzên siyasî karibin li hember her tiştê diqewime rabin yan jî karibin encamên wan yên xirab li ser gelê Kurd sivik bikin.

Sê bajarên Kurdan têkçûn, li sala borî Efrîn ji aliyê Tirkîyê ve hate dagîrkirin, û niha Serêkaniyê hat dagîrkirin, hevdem digel radeştîkirina Kobanê ji bo rejîma xwînrij ya Sûriyê. Pîrsek mezin derdikeve holê: Li hember vê tofanê çi bikin? Rejîma Tirkîyê artêşek damezrand ji dehhezaran çeteyên îslamî û paşmayê DAIŞê ji bo xizmetkirina ecendeyên Erdogan, ku gilopeke kesek ji hêzên navnetewî bideşt xîstîye ji bo dagîrkirina herêmê, tevî ku xalên rêkeftina Tirkî-Rûsî siviktir in ji xalên rêkeftina Amerîkî-Tirkî, lê xuya ye ku hîn jî metirsî heye. Bi hezaran qurbanî şehîd, birîndar û koçber hene, zêdebarî




wêrankirina jêrxaneya aborî û xizmetgozariya herêmê.

Niha jî ji bo gelê Kurd xemek mezin e, metirsî hîn jî dimîne, û hêzên kurd gelek rêçare û bijarde nînin, em li hêviya mû'cîzeyekî ne ku rû bide?

Qamişlo 23.10.2019

-Boçûnên nivîskar boçûnên Rojnameya Agirî nînin

Pirsa Kurdî û peymanên navdewletî



N: Zehra Ehmed

Gelê kurd, ne bi şeran tîk diçe, belê bi peymanên navdewletî û herêmî yên ku nexşeya jeopolîtîk ya Kurdiştanê perçe kirine tîk diçe, ji Mehebad û Kerkûkê heya Efrîn û Serêkaniyê, gelê Kurd û mafên wê yên rewa bûne qurbanîya rêkeftinên navdewletî yên herêmî, di şûna berjewendiyên navdewletî û bazarên neftê de.

Kembera Tirkî-Erebî xencera jehrê ye di piştî cografiya kurdî de. Rêkeftina Amerîka-Tirkîye û ya Rûsiya-Sûriyê, erdnigarî, canê me, û ne jî



mafên me, neparêze. Xizmeta me ya ji bo cîhanê û jinavbirina rêxistina terorê ya herî mezin, ji bo gelê me bi ziyaneke mezin hat û ti mîfayek siyasî nebû.

Xiyalên Osmanîyan careke din nexşeya Kurdiştanê parçe dike bi oparesyonên leşkerî û bikaranîna çekên kîmyayî û heta bi serbirînê.

Sînoren dewleta Sûriyê dişkîne û qanûnên navnetewî bînpê dike, û ala xwe li ser axa Sûriyê bilind dike bi bînpêkirina serweriya dewleta Sûriyê, ku hê jî endamê Netewên Yekbûyî ye. Artêşa Tirkîyê digel çeteyên opozisyona sûrî yên bi navê

artêşa azad, tawanên şer û dijemirovî li dijî gelê kurd pêk tînin. Tiştê dibe dagîrkariye, ji ber ku herêmên ewle, pêdivî heye ku di bin parastina NY de û rêveberiya wê herêmê bi destê pêkhatîyên wê deverê be, ne di bin oparesyonên leşkerî û guhertina demografî de. Tirkîye dixwaze herêmeke dagîrkirî durîst bike bi bînpêkirina hemû pîrensîp û peymanên navdewletî, berevajî avakirina herêmek ewle, bicîhkirina koçberên Sûrî li deverên kurdî, û bi vî rengî guherîna demografîk, bi rêya dagîrkariyê ji Serêkaniyê heta Efrînê.

Lampa kesk ya Rûsî-

Amerîkî bû harîkar ji bo rijandina xwîna sivîlên kurd, û veto ya wan di Encûmena Ewlehiya navdewletî de bû amraz ji bo paraştina berjewendiyên navdewletî û herêmî û hevalbendên wan yên stratejî li beramberî bînpêkirina mafên gelê me yê bindest. Civata navnetewî, rêxistinên mafên mirovan û Netewên Yekbûyî, bi hemû saziyên xwe ve, gunehbar in li hember qirkirina mîletê Kurd û guhertina dîmografiya Kurdiştana Sûriyê. Ji ber vê yekê, divê mala Kurd ji nû ve were sereraştîkirin, divê nakokiyên siyasî nebin asteng li pêşîya yekrêziya gelê Kurd û bilindkirina berjewendîya bilind ya gelê Kurd. Ku divê em bixebitin ji bo nûkirina Peymana Duhokê ya di bin çavdêriya Serok Mesûd Barzanî de, ku hîn jî bingehek e ku li ser rizgariya me ava dibe. Divê biryarên me yên çarenivîs û biryarên aşîfî û şer bi destê gelê Kurd be.

22.10.2019 Dêrik- Rojava

Qonaxeke nû li jiyana siyasî ya Rojavayê Kurdistanê



N: Azad Kurdî

Oktobera reş careke din li derê kurdan xişt. Mixabin di naverasta meha Oktobera 2019'an de, hêzên leşkerî yên Turkiyê û çekdarên Sûrî ku Turkiyê piştgiriya wan dike, bi armanca dagirkirina axa Rojavayê Kurdistanê, hêriş bo ser Rojava dest pê kirin. Qonaxa yekemîn dagirkirina Efrîn bû û niha armanca wan dagirkirina hemû Rojavayê Kurdistanê ye. Ev yek dibe qonaxeke nû di jiyana siyasî ya Rojavayê Kurdistanê de.

Piştî ku sala borî Turkiyê dest bi dagirkirina bajarê Efrînê kir bi hevkarîya çekdarên nêzik bi xwe yên Sûrî, mixabin bê helwestî û bêdengiya dewletên mezin ên cîhanê wisa kir ku Turkiyê dubare xwe re dît ku hemû axa Rojavayê Kurdistanê bike armanca dagirkirinê. Ev yek jî kir. Ligel ku di pêvajoya vê qonaxa nû ya hêriş bo ser Rojavayê Kurdistanê de, raya giştî ya cîhanê bi gelê kurd û doza Kurdistanê re bûye, lê Serokê Amerîka bi Erdoxan re li ser vê hêrişê lihev kir û di hefteya duyem a hêrişê de heta pîrriya hêzên Amerîkî li Rojavayê Kurdistanê vekîşandin.

Ev helwesta Serokkomarê Amerîka û derfet dayîna wî bi Turkiyê bona dagirkirina axa Kurdan li Rojavayê Kurdistanê, pêleke nerazîbûnê ya berfireh di raya giştî ya Amerîka û hemû cîhanê de bi xwe re anîye. Vê rewşê cîhan matmayî kir ku çawa Amerîka kurdên Rojava ku çend salan li pêşiya çeperên têkşikandina DAIŞê de bûn, bi tenê hêlan û derfet da Turkiyê bi rêya hewayî û



bejayî dest bi qirkirina kurdan bike.

Hevkarên Serokê Amerîka ji bo ku hinek zext û rexneyên li ser Donald Trump sivik bikin, di hefteya duyem a şer de, hatin Turkiyê û şanoyek bi navê lihevhatin bona sekinandina demkî ya şer îmze kirin, lê naveroka wê lihevhatinê hemû bi sîd û qazancê hêrişa Turkiyê ye û çî berjewenduyê kurdan li Sûriyê nehatiye berçavgirtin. Ev lihevhatin bi eşkere rê dide dagirkariya Turkiyê bi çend armancên taybet : Yekem, ji nav birina pîrsa kurd li Rojavayê Kurdistanê û pêşveçûna pîrsa kurd li vî parçeyî, guherîna demografiya navçeyê û anîn û nîştecihkirina bi milyon Erebên Sûrî ku li Turkiyê dimînin, xurtkirina komên çekdar ên bin piştgiriya Turkiyê û vegeandina rolê dubare yê bihêz ê Turkiyê bon av guhertinên Sûriyê de û ...

Ligel ku rêveberiya Kurdî li Rojava ligel Rûsiya û Sûriyê lihevhatineke leşkerî îmze kir bona kêmkirina zextên hêrişa Turkiyê, lê me dît artêşa têkşikayî û lawaz ya Sûriyê 1 jî sedî jî di vê hêrişê de pişt hêzên kurdî negirtiye li hember hêrişa Turkiyê û çekdarên ser bi wî welatî yên Sûrî.

Bi qonaxa nû ya guhertinên Sûriyê, Amerîka rolê xwe yê lawaz jî li Sûriyê da Rûsiya û bi vî awayî Rûsiya û Îran ji aliyekê û Turkiyê ji aliyê din dibin lîstikvanên sereke yên Sûriyê. Dîjkiyarên rêjîma Îranê li dijî hêrişa Turkiyê tenê girêdayî pîrsa îdeomojîk a Îranê ve heye, Îran weke rêjîmeke îdeolojîk a olî xwe weke serkêşê eniya şîiyan li herêmê dizane, lewma hemû pîrs û lêgerên Rojhilata Navîn di vê çarçoveyê de dibîne. Nigeraniya Îranê ne kurdên Rojava ne, belkî tîrsa wan ji bicîhkirina Erebên Sûrî yên Sunnî ne ku li Turkiyê dimînin û xurtbûnê rolê Turkiyê jî iwan li Sûriyê. Ger na ew ji Turkiyê zêdetir neyar û dijberên pîrsa kurd in li her 4 parçeyên Kurdistanê. Ev yek metirsiyeke berçav e bona maf û azadiyên kurdan li Sûriyê. Ji ber ku Rûsiya qet naxwaze ji Turkiyê derbas bibe bona kurdan, lewma rewşa kurdan û pîrsa kurd li Rojavayê Kurdistanê di mehên pêş de ligel lêger û pêşhatên nû rûbirû dibe.

Ligel ku piştperdeya bûyerên Rojhilata Navîn, nîşaneyên xerab derbarê pîrsa kurd bi giştî didin xuyakirin, lê 2 pîrs dikarin pêvajoyê bi qazancê kurdan biguherînin, yekem, zext û nerazîbûnên raya giştî ya cîhanê wisa bike ku bi taybet dewletên Ewropî wê navçeya ku Turkiyê dagir kiriye, biparêzin û rêve bibin û kurd bi diplomasiyeke berfireh bi qazancê kurdan vegeandînin. Ya duyem jî lihevkerin û yekîtiya hemû hêzên kurdî li tevgera Rojavayê Kurdistanê bona dabînkirin û parastina berjewendiyên kurdan li Sûriya nû de.

Lîstika walîbolê



N: Bûbê Eser

Gardiyan:

Rewşa lêdanê bi awayekî rêkûpêk heta sala 1982-an berdewam bû. Lêdan û îşkence qet kêm nedibûn, her ku diçû zêdetir û hîn jî firehtir dibûn. Ji ber wan lêdanên me êdî nav û dengê girtîgehê, him li Tirkîyê û him jî li cîhanê bi awayekî negatîf ango nebaş hatibû belavkirin. Ji ber vê yekê car-carna hin heyetên, mafê mirovan, yên Tirkan û hin jî ji derve dihatin.

Ji bona ku yuzbaşiyê me, wan progpagandên dihat kirin, bi awayekî neraşt bide zanîn, wî êdî lêdana fizîkî kêm kiribû. Her çiqa lêdana fizîkî kêm bûbû, lê li hem-berî vê, îşkenceya pisikolojîk zêdetir bûbû. Ji ber vê yekê bû ku li wê girtîgehê rehetî peyda nedibû û lêdan nediqediya.



Ji bona ku em bikaribin, bi rehetî, wan komelên ku mafê mirovan diparêzin bixapînin, di girtîgehê de ji heftê rojekê, bû bû roja sporê. Her qawîş rojekê diviyabû, sporê bikin û bi topê bilîzin.

Me bi pereyên girtiyan ji bona her qawîşekê ji bo lîstika walîbolê top û tor da bû kirîn. Me ji bo kirîna wan tiştan pereyekî gelekî zêde ji girtiyan standî bûn. Di deştêka kirîna van de kêfa girtiyan hat ku ew ê êdî, bikaribin di nava xwe de bi topê jî bilîzin. Lê em ne weha difikirin. Me êdî baş dizanîbû ku lêdana fizîkî ji bona girtiyan, ne pir zehmet e, ew jî êdî fêrî lêdanê bû bûn.

Weke min got, me ji bona her qawîşê topa walîbolê û tora wê bi perên wan da kirîn. Rojên lîstina wan jî me tiştên gelek ecêb dianîn serê wan.

Her cihekî fêrkiirne me torek lê girêdabû. Dema kesên heqê mirovan diparastin, dihatin û çav li wê torê û lîstika girtiyan ya topê diketin, baweriya wan çêdibûn ku va ye, girtî dikarin topê bilîzin, sporê bikin. Lê tiştên me dianîn serê girtiyan, ji bilî me tu kesekî din pê nedizanîbûn. Me li wan weha dikir:

Di wê roja ku diviya bû, spor bihata kirin, me qawîş derdixişt derve. Du Tîpên (taximê) ji 12 kesan pêk dihat. Wan dilîst, lê çawa dilîstin? Pêwîst bû her dem di rewşa nîzamî de bana. Tenê dema top dihat cem wan dikarî bûn deştê xwe rakirana

û li topê bidana, dûre dîsa têtetana sekina nîzamî. Li dora xwe mêzekirin, bi dengê bilind gazîkirin, axaftina bi hev re ûhw. qedexa bû.

Kesî nikarîbû ji kesekî din re bigota “ka topê bavê vira” dema kesî li topê neda, yan jî ew biketa, îcar me ew dibirin jor û lêdan lê fikir ku ji bona çî tu xweş nalîze. Eger du kes bi şaşî li hev biketana, herduyan jî lêdan dixwarin. Dî dawiya lîstikê jî me ew kesên ku zora yên din biribûn, li hev siwar dikir û weha çend caran li dor hola topê dida bazdan. Lê ya xweş ew bû ku dema me kesê him bi kîloyên xwe û him jî bi qelefetê xwe ê giran û mezin, li wan kesên kêm qavet û yên biçûk dikir, dîmeneke xweş derdiket holê û em ji kena diketin.

Ew kesên bi topê jî nedilîstin, wan nikarîbû, ji hevalên xwe re xwenîşandan bikirina. Bi awayekî azad meş kirin û bi hev re xebardan û cixarê kişandin qedexa bû.

Roja spora wan, roja îstîre-heta wan weha bû ku gelek caran wan nedixwestin derkevin derve û bi topê bilîzîn. Bi topê lîstin ji bona wan ji meşê zortir bû.

Pilan li ser Kurda ye

N: Lezgîn Dêrûnî

Di dîrokê de diyar e her-tim gelê Kurd bi mîrxasî û mîranî berxwedan di ber hebûn û mafê xwe de kiriye, û tucarî serê xwe ji dijmin re netewandiye, lê mixabin bê tifaq in, ji bêtifaqiya wan heta roja îro bindest in. Îro li Rojavayê Kurdistanê êrîşeke hovane ji aliyê dewleta Tirk ve li ser tê kirin, tevlî çeteyên wê, armanca wê dagîrkirin û guhertina dîmografiya wê ye bi pilaneke ji aliyê dewletên xwedîbandor di kirîza Sûrî de, wek Emerîka, Rûsya, Îran her yek li gor berjewendiyên xwe bi navê herêmeke aram.

Amerîka naxwaze Tirkîye ji deşt xwe derxe, û Rûsya dixwaze Amerîka ji Sûrî vekîşe, da rîjîma Sûrî cardin vegere herêma kurdî, û Îran dixwaze milîsên wê di navbera sînorê Îraq û Sûrî de bimînin, da riya wê vekirî be, ta Libnanê.

Lê mixabin Kurd tenê dûrî van pilanan û lihevkiirinan e, jiber ku di aliyê siyasî de teba û yekgirtî nînin, û li hev nakin û bê tifaq in, tenê PYD û hêza HSDê berpirsiyariya Rojavayê Kurdistanê bi xwe girtiye, û ti aliyê kurdî qebûl nake, lê biraştî berxwedaneke lehengî dike li dijî êrîşa Tirkîyê, û çeteyên wê. Lê destek tenê li çepka nade, û di aliyê siyasî de jî lawaz e, û neçar ma ku rêkeftinekê bê şert û merc bi rîjîma Sûrî re bike,



piştî vê ku Amerîka xwe ji pişt wê da alî û ev cihê metirsiyeke mezin e li ba mîletê kurd li Rojavayê Kurdistanê, ku dîse rêjîm vegere bi wî mêjîyê xwe yê berê, û mafê kurdan nepejirîne, û ev derfeta dîrokî dîsan wek hercar ji deşt kurdan derkeve.

Dagîrkari û cînosayda ji aliyê Erdoxan ve



N: Dara Natiq

Di heyama sê salên derbasbûyî de, neteweya Kurd li Rojavayê Kurdistanê, her carê û bi avayekî hovane û bi hincetên curbicur û di raştî de bi merema dagîrkari û guherîna demografiya Kurdistanê û komkujiyê bi êrişa leşkerî a dewleta Turkiyê re rûbirû bûye. Cara yekemîn bi hinceta şerê li dijî DAÎŞ-ê û bi merema qutkirina pêwendiya di navbera bajarê Efrîn û Kobanê. Di vî şerê han de ku nizîk heşt mehan dom kir, dewleta Turkan karî merema xwe bipêke û bi kavilkirina gund û bajarên Kurdan û bi harîkarî û cigîrkirina girûpên terorîsî li vê herêmê û koçberkirin û komkujiya Kurdan xwe bigehîne heya bajarê Elbabê. Cara duyemîn di sala 2018'an de, bi mifahwergirtin ji rewş û zirûfa siyasî a herêmî û sûriyê, di şerekî du mehî da û bi êrişek hovane karî deşt bi ser bajarê Efrînê de bigre û beşek zor ji xelkê vî bajarî û derdora wê bûne qurbanî û koçber bûn û ew herêm kete bin dagîrkariya rejîma Erdoxan û girûpên terorîst û tundajo yên ser bi Turkiyê.

Cara sêyem jî di 9'ê meha Oktobra 2019'an de, bi hinceta çêkirina herêmek arama û şerê li hember terorê û veğerandina koçberên Sûriyê yên li wî welatî bo wê herêma aram, bi hilkirin çiraya kesk ji aliyê Amerîkayê ve, bi awayek berfireh ji rêya esmanî û zemînî ve êrişî ser Rojavayê Kurdistanê hate kirin. Armanca dewleta Erdoxan ji wan êrişên li pey yek ew e ku;

-Tiştêk bi navê xweseriya demokratîk û kiyaneke siyasî a Kurdan li Rojava nemîne, û îradeya siyasî û neteweyî a Kurdan di bingeh de bife-tisîne.



-Koçberkirina bi hezaran Kurdên vê deverê û cihgîrkirina zêdey sê milyon Ereben sunî yên koçber li gund û bajarên Kurdan bi merema guherîna demografiya Kurdistanê û qutkirina sînor û pêwendiyên di navbera Kurdistanê Bakûr û Rojava ji rêya cihgîrkirina wan Ereban li vê herêmê de.

-Dagîrkirina bi dirêjahiya 200 kîlometir û kûrahiya zêdey 32 kîlometran ji axa Rojavayê Kurdistanê ku herêmek herî girîng û ştratêjîk a Rojava ye, bi taybet ev herêma ku girê Spî û Serêkaniyê bi hev ve girê dide.

-Turkiye dixwaze ji rêya vê êrişê û bi harîkariya opozisyona tundajo a Sûriyê bi navê "Ceyşa Wetenî" xwe bigehîne ser rêya sereke a "M four" û hatûçûna di navbera Qamişlo û Kobanê de bi yekarî qut bike, û bi vî avayî rêya wan du bajarên ji bajarê "Reqayê" re derbas bibe, û ew yek jî bi wateya li hev cudakirina bi kiryar a rêya di navbera wan du bajarên Kurdan ji hev e. Paşekêşeya

Amerîkayê ji Sûriyê û hilkirina çiraya kesk bo Erdoxan, bêhelwêstiya cîhana derve û piştîkirin li hevpeymanên xwe yên sereke li şerê li dijî DAÎŞ-ê de, rê ji pêşiya dagîrkari û zêdexwaziya dewleta Turkiyê re xweş kiriye. Cîhan li hember komkujiya rejîma Erdoxan û cînosayda Kurdan û guherîna demografiya Rojava bêdeng û kerr û lal e. Zêdexwaziya Erdoxan û serkevtina wî di "Rojavayê Kurdistanê" de dikare cuda ji jinavbirina kiyana siyasî a Kurdan li wir, metirsî û xeterek mezin be ji bo lawazkirin û biçûkkirina deshilata Kurdan li "Başûrê Kurdistanê" û bi hinceta şerê tevî PKK, êrişî ser bajarê Şengal û Qendil û beşek ji axa Kurdistanê Başûr bike.

Bêşik cuda ji Amerîkayê her yek ji dewletên Rûsiyê û Îranê jî, hazir in ku guh li daxwazên Turkiyê li Rojavayê Kurdistanê bi merca rêkvevtin bi dewleta Sûriyê re bigrin, û rê ji pêşiya leşkerkêşiya zêdetir a Turkiyê vekin. Ewrûpa jî ji tirsaya vekirina deriyên sînoran bi rûyên çend milyon koçberan

ji aliyê Turkiyê ve, gavek micid û bikiryar nikare bavêje, û pêşî ji leşkerkêşiya Turkan bigre. Dewletên Erebi jî tenê di çarçoveya gotin û daxûyanîyekê de nîgeraniya xwe dane eyanê. Ya girîng di vê rewşa aloz û êrişa dagîrkariya dewleta Turkiyê ew e ku; gelê Kurd bi îrade û moralek bilind a berxwedan û netewexwaziyê, li hember wan êrişan bisekinin. Hevgirtin û yekbûna hêz û aliyên siyasî yên Kurdan bi taybetî di Rojavayê Kurdistanê de, dikare garantiya serkevtin û paraştina mafê Kurdan be di darêtina zagona bingehîn a Sûriyê de, ku biryar e bi rêkvevtina hêzên herêmî û cîhanî were nivîsandin. Ezmûn û ceribîna êriş û komkujî û siyaseta cînosayda ji aliyê dagîrkerên Kurdistanê ve, raştîya han ji tev aliyekî re daye eyankirin, ku ew nikarin bi siyaseta bînpêkirina mafê Kurdan, îradeya şoreşvanî, mafxwazî û azadîxwazî a Kurdan bixin qedeman, û tevgera rizgarîxwaz a neteweya me li her çar parçeyên Kurdistanê bi moraleke bilind xebata xwe berdewam bike, û gelê me wê di daviyê de her ser bikeve.

Nerîna Lîderan



Mistefa Hicrî:

“Armanca sereke ya êrîşa Tirkîyê li ser Rojavayê Kurdistanê, gorîna demografiya Rojavayê ye.”



Donald Trump:

“Tirkîye pabendî agirbestê nebe, dê raştî sizayan bê”.



Mike Pompeo:

“Heyama tehrîmên Neteweyên Yekgirtî ên li ser çek û teqemeniya rejîma Îranê yek sale bi ser de diçe”.



Mark Esper :

“Êrîşa Tirkîyê dagîrkeriyek bêsinor e”.

Wê çî biqewime eger Xamîneyî bimire



N: Eskender Ceiferî

Mirina dîktatoran, bingeha deşthilata wan sist dike. Lê hin dîktator fikra piştî mirina xwe jî dikin.

Sipaya terorîstî a Pasdaran û eniya Reformê take aliyên Îranê ne ku di hikûmetê de cih digirin. Baweriya her duyan jî bi sîstema niha a wî welatî heye lê dîsa jî di demên dawiyê de hevrikiya wan zêde bûye.

Elî Xamîneyî rêberê rejîma Komara Îslamî a Îranê, gotarên xwe li hemberî endamên kabîneya dewletê tûjtir kirine. Li gor zanişta siyasî, her qasî ku gotara kesê yekem ê rêveberiya welat xuyatir, zelal û bê perde be, nîşana derketina aloziyan di navbera rêveberan de ye. Li Îranê jî heman tişt tê dîtin.

Di hîlbijartinên gerra yazdehem de Elî Xamîneyî, béalî bû. Lê di hîlbijartinên gerra berê a serokkomariya Îranê de piştevaniya Îbrahîm Reyîsî berendamê nêzîkî Sipaya Pasdaran dikir lê belê berovajî daxwaza Xamîneyî, Hesên Rûhanî jî eniya Refomê dîsa karî bibe serokkomar. Ji wê demê ve êdî Xamîneyî, di gotarên xwe de dewleta Rûhanî rexne dike û kabîneya wî weke bêbandor binav dike. Tevî ku Rûhanî nikare li hemberî Xamîneyî derkeve yan jî ji siyasîyên Komara Îslamî derkeve, lê belê daxwaza Sipayê tiştê din bû. Bi vî rengî jî xuya dibe ku ferqa Sipa û Rûhanî ji bo Kurdan nîn e. Tenê nakokiyên di navbera wan de bixwe hene.

Tirsa Xamîneyî ev e ku êdî Rofermxwaz weke aliyekî mayînde bikeve dewsa Sipaya terorîstî a Pasdaran. Ew êdî Rûhanî dişubîne Benîsedr û ji hêzên nêzîkî Sipaya Pas-

darên û Rêvîngên Xumeynî dixwaze li hemberî dijberên Komara Îslamî, hev bigirin. Benîsedr yekemîn serokkomarê Îranê bû ku piştî salek û çend mehan jî ber rexnegirtin ji Xumeynî avakerê rejîma Komara Îslamî, ji wî welatî hate dûrxistin.

Hêzên nêzîkî Sipaya Pasdaran ku weke radîkalên şîe tên binavkirin, piştî mirina Xamîneyî, êdî nikarin qet hevgirtî bin. Tê gotin perçebûna di nava wan hêzan de û nebûna dengê hevpar, rêberê Komara Îslamî jî bo qonaxa piştî mirina wî nîgeran dike. Di hember de, di gerra berê de Elî Ekber Haşimîyê Refsencanî karî reformxwazan li dora hev kom bike. Di vî gerrê de jî seyîd Mihemed Xatemî karî dengên wan hevgirtî û zengîn bike. Lê Sipayê dîsa jî nekarî vî karî jî bo hêzên xwe encam bide. Hilbijartinên vî carê ên Meclîsa Îslamî jî bi heman rengî dibin. Nakokî didomin lê sîstem heman tişt e û baweriya her du aliyan bi heman sîstemê heye.

Hikûmetên ku bi rengekî demokratîk nehatine avakirin, di qonaxa veguheştinê de serpehatiyeke tal didin welatîyên xwe. Ji ber ku cîgir, tenê di riya deşthilatê de tê deştîşankirin ne di riya dengdanê de. Piştî ku sala 2015’an neştergerî ji Xamîneyî re hate kirin, êdî ew gihîşte ser vî baweriyê ku belkî temenê Komara Îslamî jî girêdayî temenê wî be. Lewma nîgeraniya wî zêde bûye.

Eger piştî mirina Xamîneyî, Komara Îslamî nemîne, dibe ku Îran jî yekperçe nemîne. Ji ber ku her yek ji neteweyên nefars weke Kurd, Azerî, Erebb û Belûçan jî mafên xwe ên netewî dixwazin û gelek partiyên cudaxwaz angusîrxwebûnxwaz jî di nav wan de hene. Ew dibêjin bi vegera ser sindûqa dengdanê di Îraneke yekperçe de, dîsa jî her yek ji wan neteweyan ziyandar dibe. Ji ber ku her yek ji wan li hemberî Farsan kêmnê ne.



Heya niha çendî caran piropagendayên derew li ser mirina Elî Xamîneyî hatine belavkirin lê di raştî de piraniya wan, armancdar in. Sedema belavkirina wan piropagendeyan, amadekirina welatî jî bo qonaxa piştî mirina Xamîneyî û perçekirina zêdetir a dengên Sipaya Pasdaran e ku xwe weke mîratgirê Xumeynî û rejîma Îranê binav dike. Ev piropagende dikarin rê jî bo perçekirina Îranê jî xweş bikin. Ji ber ku eger Sipaya Pasdaran û eniya Reformê bikevin hevrikiyê, wê demê rê jî bo xebata her yek ji neteweyên nefars jî xweş dibe û di asta navdewletî de jî rê jî bo perçebûna Îranê vekirî dibe.

Refsencanî, weke cîgirê Xamîneyî dihate binavkirin ku hem bandora wî li ser Sipaya Pasdaran hebû û hem jî dengên Reformxwazan hebûn. Piştî mirina Refsencanî êdî bijardeyên din gelek kêmin ku bikarin weke Xumeynî, Refsencanî û Xamîneyî, hemû hêzan bitepisînin. Her du meleyên bi navên Cennetî û Şahrûdî gelek pîr in. Reyîsî jî nikare dengên Civata Deştîşankirina Berjewendiyên Komara Îslamî bi deşt bixîne.

Lê tevî van sedeman jî, eger kesek bikare ji hemû wan aştengiyên derbas bibe, dibe ku riya wî pişt re hêsan be. Ji ber ku sêyemîn rêberê rejîma Komara Îslamî, dibe xwedî sedan sazîyan ku hemû wezaretên dewletê û Meclîsa Îslamî a rejîmê biryara xwe ji wan diştînin yan jî bi alîkariya wan erê dikin. Raşt e ku Xamîneyî xwedî karîzma nebû û ji xeynî xwînrijekî hov tiştêkî din nîn e, lê xizmê Xumeynî bû û di dema serokkomariyê de jî dengê her du aliyan dijber û razî, kiribûn yek.

Tu kes dostê Kurd nîne, tenê bixwe nebe



N: Cemal Fethî

Kurd yek ji wan neteweyan e ku li ser topa erdê bêdewlet û bêkiyan e, û sedan sal e ji bo gihîştina bi dewletê û dewletbûnê xebatê dike û qurbanîyan dide. Hekî em bas ji datayên hûr li ser hemû karesatan bikin ku bi ser Kurd de hatine, renge serjimêriyeke wek serjimêriya qurbanîyên şoreşa Firansayê, şoreşa Cotmeha 1917-an a Yekîtiya Soviyetê û dehan şoreşên din bide dest me, ku encama wê rizgariya xelkê wan welatan ji dest diktator û zordestan bûye û niha di bin sîbera vê şoreş û qurbanîdanê de dihevin û jiyana herî baş desteber kirine.

Lê Kurd ku dem bi dem ew hemû qurbanî dane, çima heya niha jî nekariye dest bi jiyaneke serbixwe û aram bike û di bin siya xebat û berxwedana çend salan de bêhnê vede? Yan baştir e ku em bêjin çima niha jî Kurd di qonaxa şoreşê de ye, û berdewam her qurbanîyan dide? Sedema van hemû êş û azarên Kurd vedigere ser çi?

Gelo Kurd neteweyek e ku

evîndarê şoreşê ye û hez li jiyaneke aram nake? Yan sedemên din hene ku nahêlin Kurd bigihîje mafên xwe û di çarçoweya deshilateke Kurdî de azarên xwe kêmbike?

Renge di edebiyata siyasî de gellek baş nebe ku bas ji şans û îqbalê bê kirin, lê bi dîr ji hesta sozdarî hekî em bêjin neteweya Kurd cuda ji sedemên navxweyî, neteweyeke bêşans e, me şaş negotibe. Belgeya bêşansî û bextreşîya vê neteweyê hebûna wan dewlet û neteweyan e ku cîranên Kurdan in, ku tu baweriya wan

Bi maf û hebûna Kurd tune, û hebûna xwe di nebûna Kurd de dibînin, û ew boçûna ku di raştî de ji xeyalekê zêdetir nine, û hebûna xwe di nebûna Kurd de dibînin, çareseriya doz û pîrsa Kurd raştî kêşeyan kiriye, û weha kiriye ku di Kurdiştanê de şer û xwînrejî berdewam bike, û dehan serbaz û hêzên dagîrker di pêxema "tewehom" û sadeyîyê de bibin qurbanî, ku li gora şewaz û çawaniya xebata Kurd di her perçeyê Kurdiştanê de, ev rewşa, rewşeke bijan a Kurd bûye, û berdewam banga aştxwaziyê ji aliyê Kurd ve gehadine guhên dijminan, lê ji aliyê dijminan ve bi agir û asin bersiv hatiye dan.

Herçend ku Kurd neteweyeke aştxwaz e, û di hember de jî neteweyekê xwergir e, û tu demê di hemberî êrîş û gefên dijmin de neketiye qedeman, û ji xwestekên xwe paşê nekirîye, ew



taybetmendiya Kurd ji bo dijminan bi awayekî zelal hatiye selimandin.

Her çend ku bi sedema hesta pawanxwazî û xeyal û dîtingeheke şaş ku li ser Kurdiştanê heye nikarin rêçareyêke bicî di vê derheqê de hilbijêrin û tenê tiştê ku destê xwe dibin, kuştin û serkut e, ku tê de serkevtî nebûn, herçend ku Kurd jî negihîştîye armancên xwe.

Her wek hate baskirin, bêşansiya Kurd ew e ku digel dijminekê berbirû ye, ku tu awirekê li lojîk û heqîqetê nadin, û ew taybetmendiya ku di hemîyan de tê dîtin, weha kiriye ku di van deman de ku Kurd nêzî mafên xwe dibe, yekdem bin, û serbarê nakokiyên navdewletî û rikeberiyên siyasî pêkve li dijî Kurd bisekinin û yekhelwest û yekdem bin.

Di van çend rojên borî de ku Tirkîyê êrîşên xwe li ser

Kurdiştanê dest pê kirine, bo neteweya Kurd eşkere bûye ku Kurd ji bilî xwe dosteke din tune, û pîraniya welatên herêmê û cîhan li ser vê baweriyê ye, ku Kurd nabe xwedî deshilat, û bi taybetî û ji hemiyê girîngtir rejîma axûndî ya Tehranê ye, ku di vê navberê de bi du rûçikên cuda xwe derxistîye, ji aliyekî rê dide xelkê Rojhilata Kurdiştanê ku li dijî Tirkîyê xwenîşandanan bi rê ve bibin, û ji vê riyê ve hem wisa nîşan bide, ku di Kurdiştana bindestê xwe de pîrsek bi navê Kurd tune, û Kurd di Rojhilata Kurdiştanê de gihîştîye mafên xwe, û hem jî çalakvan û dilsojên gel û welat zêdetir nas bike, û wan destbiser bike, û ji aliyekî din ve di meclisa xwe de piştgiriyê ji êrîşa Tirkîyê dîkin, û êrîşê dîkin ser neteweya Kurd di hemû perçeyên Kurdiştanê de. Eva ketwara (waqî`a) Kurd û dijminên Kurd e, û me digehîne vê encamê, ku Kurd xeynî xwe tu dosteke din ê wê nîne.

Kolberekî Kurd li Serdestê hate kuştin

Kolberekî Kurd ê xelkê bajarê Serdestê, bi teqeya hêzên leşkerî yên hikûmeta Îranê hate kuştin.

Li gorî rapora ku gihîştîye Ajansa Nûçegihaniya "Kurdpa"yê, roja Yekşemî, 28`ê Rezberê, Kolberekî Kurd yê bi navê "Luqman Reşîdzade", kurê "Rehman", xelkê bajarê Serdestê, bi


teqeya hêzên leşkerî yên hikûmeta Îranê, hate kuştin.

Hêzên leşkerî bi bêyî agehdarkirina berê, teqe bi wî Kolberê Kurd kirine.

Roja Yekşemî, 28`ê Rezberê, Kolberekî Kurd yê bi navê "Setar Rehîmnîjad", kurê "Mihemed", xelkê gundê

"Derekê" a girêdayî bajarê Merîwanê, di encama li pey ketina hêzên leşkerî, ji bilindahiyê kete xwarê.

Ew Kolberê Kurd, piştî ketina wî ji bilindahiyê re, pêyekî wî şikest û ji aliyê rûniştîyê dewerê ve, bo nexweşxana bajarê Merîwanê, hate veguhaştin.



Cezayê 150 sal hepsa te`izîrî bi ser 2 hepsiyên siyasî ên Kurd de hate sepandin

Dezgeha dadwerî ya hikûmeta Îranê, cezayê 150 sal hepsa te`izîrî bo 2 hepsiyên siyasî ên Kurd ên xelkê bajarê Kamiyaranê, birî.

Li gorî rapora ku gihîştiye Ajansa Nûçegihaniya "Kurdpa"yê, 2 zîndaniyên siyasî yên Kurd ên bi navên "Heyder Qurbanî", kurê "Elî" û "Mehmûd Sadiqî", kurê "Arif" û xelkê bajarê Kamiyaranê, di girtîgeha navendî ya bajarê Sinê de, ji aliyê dezgeha dadweî ya hikûmeta Îranê ve, bi 150 sal hepsa te`izîrî hatine cizadan.

Pêka wî cezayê, "Heyder Qurbanî", bi tometa "alîkarîkirin digel yek ji Partiyên Kurd ên dijberê hikûmeta Îranê", bi 120 sal hepis û "Mehmûd Sadiqî", bi heman tohmetê, bi 30 sal hepsa te`zîrî hatine cizadan.

Ew cezaye di heyama çend rojên derbasbûyî de, bi rewşeke fermî bi wan 2 hepsiyên siyasî di girtîgeha bajarê Sinê de, hatiye ragihandinê.

Çavkaniyeke agehdar di vê derheqê de bi Ajansa "Kurdpa"yê re ragihand: Biryare ku ew 2 hepsiyên



siyasî, carek din di dadgeha şoreş a bajarê Sinê de, bên dadgeh kirin.

Hêzên îtila`ata hukûmetê, di rojên dawiyê ên meha Rezbera sala 1395`an de, ew 2 welatiyê Kurd bi tohmata "alîkarîkirin bo terorkirina çend kes ên girêdayî bi rêjîmê" hatibûne desteserkirin û cezakirin.

Di meha Reşeme a hemem salê, televîzyona Îngilîzê ziman a "Press tv" de, bi nîşandana vîdiyoyeke dokomêntarî bi navê "Ajetwanê Mirinê", di parek ji wê filmê de, nîşana zordarî kirina ser wan hepsiyên Kurd belav kiriye.

Her wisa "Mehmûd Sadiqî", 10 rojan piştî desteserkirina "Heyder Qurbanî", ji aliyê hêzên Îtla`atê ve, bi heman tohmetê hatibû desteserkirinê.

4 çalakvanê edebî di Bokanê de hatine desteserkirin



4 çalakvanê edebî ên xelkê bajarê Bokanê, ji aliyê hêzên Îtla`atê ve hatine desteserkirin û bo lêpîrsînê, bo girtîgeha îdareya Îtla`ata bajarê Urmiyê, hatine veguhaştin.

Li gorî nûçaya ku gihîştiye Ajansa Nûçegihaniya "Kurdpa"yê, roja Sêsemî, 23`ê Rezberê, 4 çalakvanên edebî ên Kurd ên xelkê Bokanê bi navên "Jaka Îsmailpûr" û "Simko Meirûftî", "Hûmen Feyzî" û "Şaho Xizrî", ji aliyê hêzên Îtla`atê ve, hatine desteserkirin.

Pêka gotina çavkaniyekî agehdar, ew 4 çalakvanên Kurd, piştî kombûna nerazîbûnê ku bo piştewanî kirin ji Rojavayê Kurdistanê bi rêveçûbû, ji aliyê hêzên Îtla`ata bajarê Bokanê ve, hatibûne desteserkirinê û bo lêpîrsînan, bo girtîgeha bajarê Urmiyê hatibûne vegihaştin.

Ew çavkanî ew jî got: Di dema desteserkirina wan welatiyan de, malên wan jî hatibûne vekolînê.

Heya belavbûna wê nûçê, ew 4 welatî di girtîgeha îdareya Îtla`ata bajarê Urmiyê de ragirtine û heya niha hegera desteserkirina wan xûya nine.

Amara xwekujiya ciwanan di Îranê de bilind bûye

Amarên fermî, bas ji bilindbûna xwekujiyê di nav ciwanan di Îranê de dike, ku nîşan dide, aştî temenê xwekujiyê kêmtir bûye ku bi rewşên trajîk xwekujiyê dikan.

Li gorî amaran pizîşkên yasayî û wezaretê Saxlemiya rejîmê, aştî xwekujiya ciwanan di sala 1397`an de %20 bûye ku amarek cergbire û herwisa hatiye gotin ku piraniya wan ciwanan ku hewla xwekujiyê didin di qonaxa xwendina destpêkiyê û navendiyê de ne.

Herwisa nûtirîn amara Wezaretê Saxlemiya rejîmê derxis-

tiye ku ji her 100 hezar kesî di Îranê de, 125 kes hewla xwekujiyê dane ku ew amar di welatên jiyaxweş de, 11.5 ji her 100 hezar kesî de ye.

"Mecîd Ebherî" Reftarnas û xisarnasê civakî, hegerên xwekujiyê bi 2 pişkan parve dike ku yek hegerên kesî û hundirîne û pişka din pîrsgirêkên civakî ne.

Herwisa ku di amaran de hatiye dîtinê, di welatê Îranê de, pîrsgirêkên civakî, di aştîke here bilind de ne û siyasîyên çewtên desthilatê bûye sedema peydabûna bêhivîtiyê di nava jiyana xelkê



wî welatî de ku bandora raştêraşt dixîne ser malbatan, bi taybet ser ciwanan.

Ew givaş û jiyana hejarane, wa ji xelkê kiriye ku bêhivî bûn ji jiyane, bigihîjê aştîke ku bandoriyê ser hundirê kesên bike û diyardeya xwekujiyê bi taybet di nava ciwanan de, roj bi roj zêdetir dibe.

Romana nû ya Helîm Yûsiv derket

Romana nû ya çîroknivîs û romannivîsê Kurd Helîm Yûsiv bi navê (Fîrîna bi baskên şikestî) derket.

Ev roman ji 127 rûpelan pêk tê û ji aliyê weşanxaneyê Peywend li Ameda Bakurê Kurdistanê hate çap û belavkirin.

Helîm Yûsiv li derheq romana xwe ya nû, ji kanala "Rûdawê" re ragihand ku, ji ber şer û rewşa dijwar a Rojavayê Kurdistanê hê jî pirtûka wî ya nûderketî negihîştîye wir. Li ser çîroka nivîsandina vê romanê jî wiha got: "Sala 2014, di dema şerê Kobaniyê de, pêwendî û danûstandina min rojane bi rêya amrazên medya civakî û telefonê, bi hinek kur û keçên Kobaniyê re hebû. Pêşniyar ji wan hat, ku ew çîrokên jiyana xwe ya rojane ji min re bişînin û ez jî romanekê ji wan çîrokên rojane birêsim."

Yûsiv ku xwediyê gelek pirtûkên çîrok û romanên naskirî ye, wiha dirêjahî da axaftina xwe: "Di dawiya sala 2015an de min hinek

ji wan kesan, mîna Rodî û herdu xwişkên wî Gulîstan û Cîhan, li Stenbolê dîtîn. Li wir jî me rû bi rû behsa nivîsandina vê romanê kir. Lê şeveke xedrê bi ser Kobaniyê de hat û Daişiyên de 264 kes kuştin, di nav wan de Rodî û Gulîstan jî hebûn. Rodî wê çaxê zavayê bîst rojan bû û bûka destbîhine Perwînê jî pê re hatibû kuştin. Vê bûyerê ez çar salan lal kirim û rawestandim. Piştî wê min Cîhan agahdar kir ku êdî ez ê romanê ji nû ve binivîsim, lê wê carê wê kesên sereke hûn bi xwe bin: Rodî û tu. Bi vî awayî min ji nû ve ev romana xwe ya nû nivîsand, ku sê vebêjerên wê yên sereke hene, yek ji wan Rodî û ya din jî Cîhan û ya dîtir jî dara gwîzê ye."

Helîm Yûsiv li ser naveroka romana xwe ya nû (Fîrîna bi baskên şikestî) jî wiha dibêje: "Ez behsa du çîrokên evîne dikim ku li ber siya alên reş û di nav wê reşahiyê de hem geş dibin û şax didin û hem jî nivco dimînin û tene serjêkirin. Bi rêya van herdu çîrokan mirov di derbarê 134



rojên berxwedana efsûnî ya şerê rizgarkirina Kobaniyê dibê xwedî agahiyên berfireh. Ez behsa fîrîna welatekî sax dikim û pê re jî bi hezarên keç û xortên mîna balindeyên xweşik û nûgihîştî dikim, ku bindestiyê û qedereke dîroka reş baskên wan şikenandine."

Di dawiya axaftina xwe de jî Helîm diyar kir ku biryar e ev roman di destpêka sala bê (2020)an de bi Soranî û Farisî û Erebi jî derkeve û got: "Niha li Başûrê Kurdistanê ji bo zaravayê kurdî yê şîrîn Soranî tê veguheştin û li Îranê ji bo zimanê Farisî tê

wergerandin û ez bi xwe wê bi Erebi amade dikim."

Helîm Yûsiv sala 1967an li bajarê Amûdê yê Rojavayê Kurdistanê ji dayik bû. Li Zanîngeha Helebê xwendina hiqûqê qedand û ji sala 2000an û vir ve li Almaniyayê dijî. Helîm Yûsiv bi Kurdî û Erebi dinivîse û danerê gelek gotar, çîrok û romanên naskirî ye wek: Mêrê Avis – Jinên Qatên Bilind – Mirî Ranazin – Sobarto – Memê bê Zîn – Tîrsa bê diran – Gava masî tî dibin – Romana Kurdî (Lêkolîn) – Auslandere Beg û 99 Morîkên Belavbûyî. Rûdaw

Şewekarên Kurd êş û azarên gelê xwe bi rengan derdibirin

Sewekarên Kurd bi reng û stabloyan êrîşa artêşa Tirkîyê ser Rojavayê Kurdistanê û êş û azarên gelê Kurd belge dikin.

Komela Reng Art ji roja destpêkirina êrîşa artêşa Tirkîyê ser gund û bajarên Rojavayê Kurdistanê ve, dest bi kampîneke xêzkirina tabloyan kirine, tê de Şewekarên Kurd tawan û bînpêkirinên di dermafê gelê Kurd û Rojavayê Kurdistanê de tînin kirin nîşan didin.

Berpîrsê Rêvebir ê Komela Reng Art Welîd Zêno di vê derbarê de ragihandiye, kampîna wan berdeyam e û tê de hejmarek ji şewekarên Kurd êş û azarê gelê xwe bi heşt û rengên xwe di tabloyan de derdibirînin.



Da zanîn jî, armanca vê kampîne ew e, bobelat û karesatên ji aliyê artêşa Tirkîyê û mîlîşayên çekdar ve li ser gelê Kurd û Rojavayê Kurdistanê tê kirin, di tabloyan de belge bikin û ji bo bandorekê li raya giştî ya cîhanê bike, ta ku ev êrîşa hovane bê rawestandî.

Hunermend Welîd Zêno bi wê jî kir, pêştir wan kampîneke wiha li ser dagîrkirina Efrînê û şewitandina dexl û danên cotkarên Kurd li Rojavayê Kurdistanê kirine. Kurdistan 24

Zimanê Kurdî

Cînavê (xwe) cînavêkî nêtar e (nêremê ye), li şûna nav û cînavên her dû zayendan (nêr û mê) bikar tê .

Wek :

- Azad xwe dide ber rojê .

- Zîn xwe diparêze . - Van hespan êmê xwe nexwariye . - Ev pale xwe diwestînin.

Ji wan mînakên jorîn berçav dibe, ku cînavê (xwe), cînavêkî neguhêrbar e, cihê hemû nav û cînavan digre, bêyî ku ruxsara (forma) wî bête guherîn . Cînavê bêhêl (xwe), di rêxistina hevokan de, cihê nav û cînavên berkar tenê digre. Anku, ev cînav, di hevokan de dibe berkarê rasteder (rastewxo) û yê nerasteder (nerastewxo) : 1- Berkarê rasteder : - Bizin xwe duxrîne - Min xwe ji sermayê paraştiye. - Karker xwe amade dikin .

2- Berkarê nerasteder : - Zîne serê xwe şuştîye . - Memo birayê xwe bir dibistanê . - Min ji xwe pirsî : Ev der kû ye ? - Tû mirovekî ji xwe re yî . - Gerek em li xwe bipirsîn !

Têbînî : 1- Ji hêla raştîvîsê ve, ku cînavê xweyî (xwe), bo

tekezîrînê (teqezîrînê) bikar bê, gerek berdewam pêrbeşt (bi) bi ser wî ve bête berdan. Anku, (bi) û (xwe) bi hev ve bêne nivîsîn .

Wek :

- Kesê li ber te, ez bixwe me ! - Te bixwe ji min re got, ne kesekî dîtir !

2- Gelek caran cînavê (xwe) û jêderên hinek karan (kirinan) bi hev re, jêderin lêkdayî, bi watene nû pêk tînin.

Wek :

-(xwe + vejîn = xwevejîn) . -(xwe + kuştin = xwekuştin) .

3-Carinan pêrbeşt (ji) bi cînavê (xwe) ve tê nivîsîn

(jixwe). Hing. (ji) nema dimîne pêrbeşt û (xwe) jî nema dimîne cînav. Her dû bêje (ji + xwe) bi hev re bêjeke lêkdayî (jixwe), bi wateya (hema, wilo, wisan) pêk tînin.

Wek : 1-- Tu hatiyî çî ?! - Jixwe ez hatime ! 2- Tu

îro neçûyî dibistan, çima ?! - Hema, wilo, jixwe ez neçûm ! 3- Te çima av rijand ? - Jixwe, wilo, (dilê min xwest...)

Car caran jî gotina (jixwe) bi wateya (bêguman, erê, helbet...)

tê . Wek : - Jixwe em dost in, çî gerek be, ez li ber te me ! - Jixwe ez tiştêkî ji ber te venaşêrim, ma em ne heval in? - Jixwe em bi hev re ne, çî bibe em ê alîkariya hev bikin

Li vir, (ji) û (xwe), her dû dûtî têgeha pêrbeşt û cînavan ketine. Ji ber vê yekê jî bi hev ve hatine nivîsîn. Lê ku (ji, xwe)weku pêrbeşt û cînav bikar bê, gerek ji hev cuda bêne nivîsîn. Wek : - Ez ji xwe re li karekî digirim . - Nêrgizê ji xwe re pênuşek kirrî .

Wilo jî pêrbeşt (bi) : - Ez karê xwe bi xwe dikim, ne bi kesekî dîtir . - Nêrgiz bi xwe û birayê xwe mijûl e .

C- Cînavên Hevayî, (Hev, Hevûdû, Êk, Êkûdû) .

Cînavên bêhêl, ên hevayî ew cînav in yên ku li şûna nav û cînavên komjimar ên her sê kesan (kesê yekem ê peyîver û kesê duem ê guhdar û kesê seyem ê nediyar) bikar tên . Wek : 1- Kesê yekem (peyîver) : - Ez û tu, em hevalê hev in - Ez û Azad û Reşo, em birayên êk in - Me ji hevûdû hez kir - Em ji êkûdû hez dikin .

2- Kesê dûwem (guhdar) : - Tu û Azad, hûn birayên hev in - Tu û Zîn û Şîrîn, hûn hevalên êk in - Hûn tev dostên hevûdû ne - Hûn û ew, hevalên êkûdûn ne

3- Kesê sêyem (nediyar) : - Zîn û Nêrgiz xuşkên hev in - Reştêm û Şêrgo birayên êk in - Ew pale xizmên hevûdû ne . - Ew keç xuşkên êkûdû ne .

Di rêxistina hevokan de cînavên bêhêl ên hevayî cihê nav û cînavên berkarên rasteder û yên nerasteder digrin. Anku, ev cînav, di hevokan de dibin berkarên rasteder (rastew xo) û yên nerasteder . Wek : 1- Berkarên rasteder : - Gerek em hev biparêzin - Xwendekar hevûdû fêrî zimanê kurdî dikin - Hûn êkûdû perwerde dikin .

2- Bernavên nerasteder : - Em dostên hev in - Hûn pismamên êk in - Zarok bi hevûdû re dileyîzin

Dom heye...

Agirî

- ◆ Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
- ◆ www.Kurdistanmedia.com
- ◆ www.Agirimedia.org
- ◆ rojnamaagiri@gmail.com
- ◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (360)

Merasima bidawîhatina dewreyeke din ya destpêkî ya pêşmergeên Kurdistanê li çiyayên sînorî

